

Dumahîk: Ahenga bîranîna

pêwendiyekê di navbera bergêhên beşdarbûyî de bi mebesta xwendineke lihevhatin û li hevbanînê û hêviya avakirina dezgeheke rewşenbîrî, da ku karekî hevbeşî demokratîk di kultûr û kelepûreke hevgirtî de bikar bînin û em karibin derbarê projeya standarkirina zimanê kurdî û bi globalîzmê ve girê bidin.

Bêgoman, Cegerxwîn mizgîniya projeyeke spehî ji me re diyar kiribû dema gotiye: ne pir maye kurê min Cegerxwîn hunê

serbest bibin mizgîn û mizgîn

Çi tiştên ku baş bin bixwînin timî welatê me ronî dikin ew hemî

Diyar e ku Seyda li gorî derfetên xwe car cara, pêngavên bê hejmar avêtine û berhemên yekta afirandine û bi mereqa dîtina serbestiya çeleng hatine.

Seyda bi temtêlê civaka xwe û evîn û heskirina dîmenên welatê xwe ber bi sînorê nûjeniyê û banbilindiyeke mirovane û şaristanî ve çûye. Bi vî awayî, em dibînin ku rewanbêjî pêwistî xweşîkbûn û gotinê ye, pêwistî avakirina hevgirtin û heskirinê ye, ev bîr û bawerî li nik milletê me û li ba kovar, nivîskar, çalakvan û rewşenbîrên me bibe dergûşa biratiyê û her ala rêveçûna jiyanêke aştiyane, wekhevî, hevparî, xwegirtî bilind bimîne.

Li dawiyê, em sipasiya herkesê beşdar ji bo vê bîranînê dikin.

Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê

Lêkolînek ji bal rêzdar **Derwêşê Derwêş** ve li ser jîngerîya Seyda, û yek ji bal rêzdar **Rezoyê Osê** ve, û yek ji bal rêzdar **Xalis Misewr** ve di ahengê de hatin xwendin. Birûskêk ji malbata Cegerxwîn ji bal **Kesrayê Cegerxwîn** ve hate xwendin, û helbestvanê kurd **Arjen Arî**, ku ji **Amedê** beşdarî ahengê bûbû, gotineke devkî li ser hin bîranên xwe digel seydayê nemir pêşkêşî beşdaran kir. Gotineke devkî ji mamoste **Deham Ebdulfetah** ku hin têbîn li ser dîrokzanî û zimanzaniya seyda anîn zimên. Herweha, gelek helbest, birûsk di şevê de hatin xwendin.

Helbestvanên ku derfet ji bo xwendina helbestên xwe dîtin ev bûn: Rêzdar Xelîl Sasonî, rêzdar Salihê Heydo, rêzdar Bêwar Ibrahim, rêzdar Narîn Umer, rêzdar Hozanê Girkundê, rêzdar Hîmen Mendanî. Li dawiyê, rêzdar Salihê Silo helbesteke Seyda bi dengê xwe pêşkêşî beşdaran kir

